Ronahî
şopdara rastiyê ye
Hejmar : 390 nameronahi@gmail.com 06- Hezîran - 2018 Rojnameya Siyasî û Çandî

# Sewalvanî kêm dibe






Ev sal ne tenê ji bo cotkaran zehmet bû. Ziyanên mezin gihan çandiniyê jî. Lêçûna xwedîkirina sewalan jî bilind bû. Ji ber vê yekê sewalvan neçar man ku nîvê sewalên xwe bifroşin da ku karibin lêçûna nîvê din peyda bikin.
Sewalvan û bi taybet ên koçber xwedîkirina sewalan di jiyana xwe de esas digrin. Lê ji ber kêmbûna baran, çêrê û bilindbûna lêçûna xwedîkirina sewalan sewalvan neçar man ku nîvê sewalên xwe bifroşin.
Tevî hemû zehmetiyên jiyanê heta niha sewalvan parastina sewalvaniya xwe dikin. Di vê salê de ji ber kêmbaranê û dîsa ji ber barana bê wext rabûna lehiyê ya li nava zeviyan, lêçûna xwedîkirina sewalan bilind bûye. Ji ber vê yekê êm buha bû. Her wiha sewalvan di xwedîkirina sewalan de zeviyên ceh û genim ê ku ji ber barîna baranê ziyan dîtine ew neçar dimînin ku bifroşin, kirê dikin da ku sewalên xwe lê biçêrînin.
Sewalvanê bi navê Hisên El-Hemûd ku şivantiyê li navçeya Eyn Îsa dike diyar kir ku êm ku ji sewalên xwe re dikirin jî ne di rewşeke baş an buhayeke erzan de ye. Zêdebûna daxwaza li ser êm hişt ku buhaya wê bilind bibe. Niha buhaya kîloyeke kayê 35 lîreyên Sûriyê ne û buhaya kîloyeke ceh jî bêtirî 150 lîre ye.
Bêrîvana bi navê Selame El-Ehmed girêdayî heman mijarê wiha got: “Ji bo ku em debara xwe werbigirin, li şûna sewalvaniyê bijarkeke me ya din tune ye. Ev cara yekemîn e ku di vê astê de lêçûna sewalan em didin.”...***ANHA***

## Xwarina gelêrî rûnê sax

Rûnê sax yek ji xwarinên kevin ên gelerî li ba civaka koçeran e û sedema tenduristî û hêza laşê wan e. Rûnê sax xwarineke gelerî ya Rojhilata Navîn û bi taybet a civakên koçeran e û sedema tenduristî û hêza laşê wan e. Rûnê sax di gelek xwarinên din de jî tê bikaranîn û bi taybet şîraniyan. Rûnê sax ji şîrê pez tê çêkirin û heta roja me ya îro berdewam tê çêkirin.





### RÊBAZA ÇÊKIRINÊ

Di destpêkê de nivîşk ji şîr bi riya keyandin tê derxistin. Di serdemên kevin de bi meşkê (çermê pez) dihat keyandin û niha alavên keyandinê yên bi kehrebeyê derketine.
Piştî ku nivîşk tê derxistin xwê lê tê zêdekirin da ku rûnê sax bi ser bikeve û madeyên din jî dadikevin jêra lûlikê. Piştre rûn di lûlikeke din de tê rakirin û di serdemên kevin de rûnê sax di kûzên sêramîk de dihat rakirin û parastin.
meşk jî ji çermê beranan tê çêkirin ango bi pisportî tê gorandin û piştre hêriya çerm jê tê jêkirin û paqijkirin û piştre nêzî 15 rojan dixin ava xwê. Piştî ku çerm di nava ava xwê de tê meyandin, dest û piyên wê tên dirûtin û gelek caran dimsê hinaran dixin meşkê da ku tama xwê jê biçe. Di çêkirina rûnê sax de jin pispor in. Girêdayî vê mijarê bêrîvana bi navê Necme El-Nasir a ji gundewarê navçeya Eyn Îsa ya kantona Girê Spî got ku rûnê sax di jiyana wan de madeyeke sereke ye û wiha anî ziman: “Çêkirina rûnê sax ji serdemên kevin ve ye û tenduristiya mirovan diparêze.”...***ANHA***

# Minbic.. Piştî rizgarkirinê pêşketinên mezin -5-







Bajarê Minbicê piştî ku ji aliyê Meclîsa Leşkerî ya Minbicê ve hate rizgarkirin, ji bajarekî tarî û bê rih veguherî bajarekî aram. Her wiha bi hezaran koçberên ji seranserî Sûriyê berê xwe bidin vî bajarî. Lê dîsa jî dijminan aramiya bajêr armanc dikirin û siyasetên cûda li dijî wê birêvedibirin.
Di 12’ê Tebaxa 2016’an de bajarê Minbicê hate rizgarkirin û Şervanên Meclîsa Leşkerî ya Minbicê mizgîniya serkeftinê dan ku serdema reş a DAIŞ’ê bi dawî bû û dest bi qonaxeke nû hate kirin.
Minbic di dema dagirkeriya DAIŞ’ê de, hat hilweşandin û talan kirin. Niha ji nû ve hinaseya azadiyê werdigire û careke din li ser piyên xwe disekine.
Meclîsa Leşkerî ya Minbicê piştî ku bajar rizgar kir dest bi hemleya paqijkirina bajêr ji bermahiyên çeteyan kir.

### GAVA YEKEMÎN AVAKIRINA KOMÎNAN

Meclîsa Sivîl a Minbicê piştî rizgarkirina bajêr weke gava yekemîn li ser avakirina meclîs û komînan tavilê dest bi civînên xwe yên bi welatiyan re kir û girîngiya avakirina meclîsên herêmî û komînan şîrove kirin.
Di nava komîn û meclîsan de gelek komîte hene û pêdiviyên welatatiyan pêşwazî dikin.
Meclîsa Sivîl a Minbicê piştî ku hat avakirin û şûnde di nava çend mehan de bi sedan komîn û meclîsên tax û gundan ava kir û van komîn û meclîsan dest bi xebatên xwe kirin.
Rêveberiya Sivîl a Demokratîk a Minbicê û avakirina herdu meclîsên Zagonsaz û Rêveber hatin ragihandin
Meclîsa Sivîl a Minbicê piştî hat vakirin bi 8 mehan bingeha Rêveberiya Sivîl a Demokratîk a Minbicê anî û Meclîsa Zagonsaz ji bo birêvebirina bajêr ava kir.
Rêveberiyê bi beşdariya hemû nûnerên pêkhateyên Minbicê di 28’ê Çileya 2017’an de Meclîsa xwe fireh kir, hêjmara endamên xwe ji 43’an derxist 132 endaman da ku hemû pêkhateyên herêmê karibin cihê xwe di meclîsê de bigirin.
Di 28’ê Sibata 2017’an de ango piştî mehekê Meclîsa Sivîl a Minbicê hate guhertin û bû Rêveberiya Sivîl a Demokratîk a Minbic û gundewarê wê, Zeyneb Qember û Îbrahîm El-Qeftan weke hevserok hatin hilbijartin.

### REWŞA BAJAR BAŞTIR DIBE

Piştî ku meclîs û komîn hatin avakirin û bermahiyên şer û çeteyan hatin paqijikirin, bajarê Minbicê derbasî qonaxeke nû bû û jiyana li bajêr ji nûve geş û zindî bû.
Tevî aloziyê li Sûriyê jî bajarê Minbicê di aliyê binesazî, aborî û xizmetguzariyê de ji nû ve tê avakirin û parastina wê tê xurt kirin.
Di bajêr de piraniya saziyên xizmetguzarî, ewlehî û civakî hatin avakirin û niha jiyana li bajêr birêxistin dikin.
Li bajarê Minbicê tevgereke bazirganî ya mezin heye. Rêveberiya Sivîl jî hewl dide sîstema koperatîfan li herêmê pêk bîne û gelek proje li herêmê pêşxistin.
Piştî rizgarkirina bajêr Meclîsa Sivîl tavilê dest bi vekirina dibistanan kir û bi sedan mamoste ji bo perwerdekirina zarokan amade kirin.
Di sala 2017’an de 340 dibistan ji giştî 400 dibistan hatin vekirin û di van dibistanan de bêtirî 120 hezar xwendekar hatin bicihkirin.
Li bajarê Minbicê her wiha akademiyên pêşxistina hişmendiya fikrî yên weke akademiya ciwanan a bi navê “Akademiya Şehîd Hozan Can” û “Akademiya Îsmaîl Ebû Hesen” hatin vekirin û van akademiyan jî bi sedan endamên saziyên herêmê perwerde kirin.
Rêveberiyê her wiha rewşa rêxistinî li Minbicê û gundewarê wê gelekî pêş xist û piştgiriya avakirina Yekîtiyan yên weke Yekîtiya Hunermend û Rewşenbîran kir.

### PARASTIN

Meclîsa Leşkerî ya Minbicê parastina sînorên bajêr girt ser milên xwe û li hemberî gelek êrîşên artêşa dagirker a Tirkiyê û komên çete yên girêdayî wê sînor parast. Her wiha Hêzên Ewlehiya Hundirîn jî ku piştî rizgarkirina bajêr hatibû damezrandin xebatên xwe yên parastina ewlehiya welatiyên sivîl li bajar û gundên wê didomîne.
Hejmareke mezin ji ciwan û jinên ciwan beşdarî nava hêzên Meclîsa Leşkerî ya Minbicê bûn û ji bo perwerdekirina van ciwanan gelek akademî hatin vekirin. Yek ji van akademiya Akademiya Şehîd Feysel Ebû Leyla bû.

### JI BO KOÇBERAN BÛ CIHEKÎ BI EWLE

Bajarê Minbicê ku di serdema DAIŞ’ê de weke zîndanekê bû niha veguherî cihê bi ewle yê ku koçber ji seranserî Sûriyê berê xwe bidinê.
Li Minbicê bêtirî 100 hezar koçber hatine bi cih kirin.
Rêveberiya Minbicê jî hemû pêdiviyên van koçberan tevî hemû kêmderfetan bi ciha anî û du kamp li herêmê ava kirin.

### MÎNAKA SÛRIYA PÊŞEROJÊ

Bajarê Minbicê ku di dîroka xwe de weke mozayîka a çandî û etnîkî navdar e piştî ku ji çeteyên DAIŞ’ê hate rizgarkirin niha veguherî navenda jiyana hevbeş. Hemû pêkhate cihê xwe di Rêveberiya Sivîl a Demokratîk de digirin. Minbic niha veguherî mînaka jiyana hevbeş a Sûriya pêşerojê...***ANHA***

Ronahî
şopdara rastiyê ye
nameronahi@gmail.com Hejmar : 390 06 - Hezîran - 2018 Rojnameya Siyasî û Çandî

## 15 leşker û kontrayek hatin kuştin



Li başûr û bakurê Kurdistanê di navbera gêrîlayên HPG’ê û artêşa Tirk ya dagirkerde şerên giran rû didin. Gerîla di van şeran de derbên giran li artêşa tirk didin. Gerîlayên HPG’ê li Başûrê Kurdistanê, Amed, Colemêrg, Şirnex û Sêrtê li artêşa Tirk a dagirker xistin. Di çalakiyê de 15 leşkerên Tirk û kontrayek hate kuştin.***R-2***

# GELÊ EFRÎNÊ DAGIRKERAN NAXWAZE



### GEL LI DIJÎ DAGIRKERAN DAKET KOLANAN

Dewleta Tirk ya dagirker û çeteyên wê piştî ku Efrîn dagirkirin kirinên derveyî mirovî didomînin. Her roj mirovan direvînin, dikujin, malên wan talan dikin. Gelê Efrînê jî ku li hember van kirinên leşkerên tirk û çeteyên wê bê zar buye daket kolanan û xwest dawî li dagirkeriyê were anîn.


### DAWÎ LI KIRINÊN HOVANE BÎNIN

Li gorî Çavdêriya Mafên Mirovan a Sûriyê welatiyên Efrînê li hemberî kirinên dagirkeriya Tirk û çeteyên girêdayî wê, li du cihan xwepêşandan li dar xistin. Di xwe pêşandanan de ji hatiye xwestin ku artêşa Tirk a dagirker û çeteyên wê dawî li kirinên xwe yên hovane bînin. Her wiha gel gotiye wê ev çalakiyên wan dewam bikin. ***R-2***

### LI EFRÎNÊ BAWERIYAN TUNE DIKIN

Welatiyên Êzidî yên Efrînê ku ji ber êrîş û zilma dagirkeriya Tirk ji cih û warê xwe derketine, li herêma Şehbayê bi cih bûne diyar kirin ew dagirkeriya Tirk li Efrînê qebûl nakin. Welatiyên Êzidî gotin, “çeteyên dewleta Tirk Êzidiyên ku nikarin ji Efrînê derkevin neçar dikin ku dev ji baweriya xwe berdin û bibin misilman. Ew li Efrînê baweriyan tune dikin.” ***R-5***

## 24’ê Hezîranê ji bo têkoşîna demokrasiyê girîng e



Endamê Konseya Rêveber a KCK’ê Mûstafa Karasû diyar kir ku hilbijartinên 24’ê Hezîranê ji bo tekoşîna demokrasiyê yek ji girîngtirîn hilbijartinên dîroka Tirkiyê ye.
Karasû wiha got, “Erdogan, AKP dixwazin sîstemeke olperest-neteweperest ava bike. Ji ber vê yekê, eger ev sîstem ava bibe wê zext û zordariya li ser hêzên demokrasiyê, li ser hêzên gel, li ser Kurdan, Elewiyan û hemû civatên etnîkî û olî mayinde bibe.” ***R-4***

## YNK li dijî dagirkeriya Tirk derket



Berdevkê Yekîtiya Niştîmanî ya Kurdistanê YNK’ê Sedî Ehmed Pîre diyar kir ku dagirkeriya dewleta Tirk ya li başûrê Kurdistanê binpêkirina axa Iraqê ye û wiha got, “Weke YNK em hemû dagirkeriyan mehkûm dikin. Tirkiye çawa ku dixwaze serweriya xaka xwe biparêze, bi vî awayî divê serweriya xaka Iraqê jî bê parastin.” ***R-4***

## Divê kongreya çareseriyê were lidarxistin

Şandeyek ji Eniya Demokratîk a Sûriyê bi partiyên kurdî yên bi di bin banê Kombûna Demokratîk a Çepgirên Kurd ên Sûriyê, re li navenda Partiya Veguhertina Demokratîk ya li Qamişlo civiyan civiyan. Di civînê de pêwîstiya parastina yekîtiya xaka Sûriyê û ji bo çareseriya aloziya Sûriyê lidarxistina kongreyekê hat ziman. ***R-2***

## NPG’ê gerîlayên li eyaleta Avaşînê pîroz kir

Fermandariya Biryargeha Navenda Parastina Gel hêzên gerîla yên eyaleta Avaşînê ji ber çalakiya 2’ê Hezîranê pîroz kir. NPG’ê wiha got, “Ji ber vê çalakiya serketî, em hemû hevrêyên tevlî çalakiyê bûn, di şexsê fermandariya we de hemû hêzên li eyaleta we pîroz dikin. Li dijî hêzên dagiker ên Tirk ên qirker, mêtinger û faşîst, di têkoşîna şoreşgerî de em ji we re serketinê dixwazin.” ***R-2***

## AKP frena wê teqiyaye divê em bidin sekinandin

Hevseroka HDP’ê ya berê Fîgen Yuksekdag ku di girtîgeha Tirkiyê de girtî ye diyar kir ku Frena AKP’ê teqiya ye, nikare bisekine, divê em bidin sekinandin. Jin bi tifaqek xurt dikevin hilbijartinan û wê bi ser bikevin. Yuksekdag got, “Her tişt ji muxalefetê re qedexe ye. AKP bi darbe û çoyê destê xwe kampanyaya hilbijartinê dimeşîne.” ***R-5***

## QSD’ê pêngava paqijkirinê destpêkir



Hêzên Sûriya Demokratîk QSD’ê daxuyaniyek da çapemeniyê û dest bi pêngava rizgarkirina bajarokê Dişîşa û parastina sînorê Sûriye û Iraqê kir. Daxuyanî li gundên başûrê rojhilat ê Hesekê ji aliyê Berdevka Fermî ya Pêngava Bagera Cizîrê Lîlwa El-Ebdulah ve hat xwendin.
Di daxuyaniyê de wiha hat gotin, “Pêngava rizgarkirina Dişîşa li ser esasê planek ku berê hatiye amadekirin dest pê dike û wê bi artêşa Iraqê û Koalîsyona Navdewletî re bi rengekî koordîneyê bê meşandin. Hêzên me li gorî wê plana hevbeş a ji bo têkbirina terorê ber bi bajarokê Dişîşa ve biçin. ***R-2***

## Leşkerên Tirk ji başûrê Kurdistanê derxînin



Eniya têkoşîna li dijî dagirkeriya Tirk’ ku ji nûnerên rêxistinên civakî yên sivîl, parlamenter, rûspî û aktîvîstan pêk tê, li pêşiya Nûnertiya Parlementoya Kurdistanê ya li Silêmaniyê daxuyaniyek da çapemeniyê. Eniyê li ser mijarê daxwaznameyek pêşkêşî Parlamenta Herêma Kurdistanê kir. Eniyê xwest, biryar bê dayin ku leşkerên Tirk ji herêma Kurdistanê werin derxistin. ***R-5***

## Demîrtaş wê civîneke çapemeniyê pêk bîne



Namzetê HDP’ê yê Serokkomariyê Selaheddîn Demîrtaş wê li ser medya civakî civîneke çapemeniyê li dar bixe. Li gorî agahiyên ku ji aliyê HDP’ê ve hatin dayin, 6’ê Hezîranê roja Çarşemê saet 23:00 pirsên li ser Twitter, Instagram û Facebookê werin nivîsandin wê bên hevdan û ji Demîrtaş re bên ragihandin. ***R-2***

# Gelê Efrînê ji dagirkeriyê bêzar buye

***Dewleta Tirk ya dagirker û çeteyên wê piştî ku Efrîn dagirkirin kirinên derveyî mirovî didomînin. Her roj mirovan direvînin, dikujin, malên wan talan dikin. Gelê Efrînê jî ku li hember van kirinên leşkerên tirk û çeteyên wê bê zar buye daket kolanan û xwest dawî li dagirkeriyê were anîn.***



Çavdêriya Mafên Mirovan a Sûriyê ragihand ku gelê Efrînê li hemberî kiryarên artêşa Tirk a dagirker û çeteyên wê derketin û du xwepêşandan lidar xistin.
Li gorî Çavdêriya Mafên Mirovan a Sûriyê, di nava 24 saetên derbasbûyî de, bi dehan welatiyên Efrînê li hemberî kiryarên dagirkeriya Tirkiyê û çeteyên girêdayî wê, li du cihan xwepêşandan li dar xistin. Xwepêşandanek li qada Azadî ya bajarê Efrînê hate lidarxistin. Xwepêşandêran daxwaza serbestberdana rojnamevanekî Efrînî ku ji aliyê dagirkeran ve hatiye revandin kirin û gotin herger dawaza wan bi cih nehatin wê roja yekşmê dîsa derkevin xwepêşandanan.
Xwepêşandanek din li taxa Mehmûdiyê ya beşê bakurê bajêr pêk hat. Çalakvanan daxwaz kirin ku sînorek ji binpêkirinên rojane yên çeteyan û leşkerên dagirkeriya Tirkiyê were dayîn.
Çavdêriya Mafê Mirovan destnîşan kir ku, ku xwepêşandana li taxa Mehmûdiyê, piştî lêdan û heqareta li dijî xwediyekî cenatoran ku ji çeteyek ji koma "Firqet El-Hemza" ve hatî kirin, pêk hat.

## 15 leşker û kontrayek hatin kuştin



Gerîlayên HPG'ê li Başûrê Kurdistanê, Amed, Colemêrg, Şirnex û Sêrtê li artêşa Tirk a dagirker xistin. Di çalakiyê de 15 leşkerên Tirk û kontrayek hate kuştin.
Navenda Ragihandin û Çapemeniyê ya HPG'ê li ser çalakiyên gerîla yên ji 29'ê Gulanê heta 3'ê Hezîranê daxuyaniyeke nivîskî weşand.
Di daxuyaniyê de ev agahî hatin dayin:
"Hêzên me di çarçoveya Pêngava Şoreşgerî ya Şehîd Pîroz û Şehîd Agirî de 3'ê Hezîranê li dijî artêşa TC a dagirker çalakiyên xurt kirin.
Hêzên me saet 03:00 li dijî leşkerên dagirker ên li dora Qereqola Bezelê ya navçeya Şemzînan a Colemêrgê derketin operasyonê li girê Şikêre Reş çalakiyeke sabotajê kirin. Hejmara leşkerên di vê çalakiyê de mirin û birîndar bûn nehate zelalkirin. Hêzên me heman rojê saet 15:20'î, li dijî yekîneyeke heman operasyonê çalakiyeke sabotajê kirin û di çalakiyê de leşkerek hate kuştin.
Hêzên me yên YJA Starê saet 17:40'î, li mintiqeya Boxaza Çeta ya li herêma Bezelê ya Şemzînanê li yekîneyeke artêşa TC a dagirker xistin. Di vê çalakiyê de ku derbên xurt li stargeheke yekîneya dijmin hate xistin, 4 leşker hatin kuştin..
Hêzên me saet 08:30'î li dagirkerên li ser girê Evdilkofî yê li herêma Bradostê ya Sîdekan a Başûrê Kurdistanê xistin. Ji cihekî nêz ve derb li çeper û stargehên dijmin hatin xistin û di encamê de 3 çeper hatin rûxandin û 3 leşkerên dijmin hatin kuştin.
Di çarçoveya Pêngava Şoreşgerî ya Şehîd Delal Amed û Şehîdên Bestayê de hêzên me 3'ê Hezîranê saet 17'an li girê qereqola Şuxa ya navçeya Dihê ya Sêrtê çalakiyeke sûîqestê kirin. Di çalakiyê de leşkerek hate kuştin.
Hêzên me di çarçoveya Pêngava Şoreşgerî ya Şehîd Delal Amed û Şehîdên Bestayê de 3'ê Hezîranê saet 08:15'an li nêzî geliyê Gosini ya Şirnexê li dijî yekîneyeke artêşa TC a dagirker çalakiyeke sabotajê kirin. Di vê çalakiyê de bi qasî ku hate tespîtkirin leşkerekî dijmin hate kuştin.
30'ê Gulanê operasyon ber bi qada Apê Mûsa ya Licê ve berfireh bû û heman rojê saet 19:30'î li dijî yekîneyeke dijmin çalakî hate kirin. Ji cihekî nêz ve derb li yekîneya dijmin hate xistin û bi qasî ku hate tespîtkirin kontrayek û 2 leşker hatin kuştin.
31'ê Gulanê saet 09.30'î hêzên me li dijî yekîneyeke dijmin a li ser rêya navbera navçeyên Licê û Hênê yên Amedê kontrola rê dikir, çalakiyeke sabotajê kirin. Di çalakiyê de 3 leşker hatin kuştin."

## QSD'ê pêngava paqijkirinê destpêkir



QSD'ê bi daxuyaniyeke çapemeniyê ragihand ku wan dest bi pêngava parastina sînorê Iraq-Sûriyê, rizgarkirina bajarokê Dişîşa û gundên parêzgeha Hesekê kirine.
Hêzên Sûriya Demokratîk QSD'ê daxuyaniyek da çapemeniyê û dest bi pêngava rizgarkirina bajarokê Dişîşa û parastina sînorê Sûriye û Iraqê kir.
Daxuyanî li gundên başûrê rojhilat ê Hesekê ji aliyê Berdevka Fermî ya Pêngava Bagera Cizîrê Lîlwa El-Ebdulah ve xwendin.
Daxuyanî wihaye:
"Di çarçoveya qonaxa duyemîn a Pêngava Bagera Cizîrê de, piştî ku bajarokê Baxozê hate rizgarkirin û dor li herêmên ku çeteyên DAÎŞ'ê lê ne hate girtin, hêzên me niha dest bi pêngava rizgarkirina bajarokê Dişîşa yê Hesekê dikin.
Pêngava rizgarkirina Dişîşa ji bo parastina sînorê Sûriye û Iraqê û paqijkirina hemû gundên parêzbeha Hesekê ji çeteyên DAÎŞ'ê ye. Li herêmeke ji 3 hezar kîlometreçargoşeyî yên parêzgeha Hesekê terorîst hene. Navenda vê herêmê jî bajarokê Dişîşa ye.

**WÊ HERÊMÊN RIZGARKIRÎ EWLE BIBIN**

Pêngava rizgarkirina Dişîşa li ser esasê planek ku berê hatiye amadekirin dest pê dike û wê bi artêşa Iraqê û Koalîsyona Navdewletî re bi rengekî koordîneyê bê meşandin. Hêzên me li gorî wê plan û şêwira hevbeş a ji bo tinekirina terorê û têkbirina wê ber bi bajarokê Dişîşa ve biçin. Armanc parastina ewlekarî û aramiya herêmên rizgarkirî û şêniyên herêmê yên salên derbasbûyî gelek zilm û zordarî ji destê çeteyan kişandin.
Ev daxuyaniya me piştî çend saetan ji tevgera hêzên me ya li ser erdê li dijî DAÎŞ'ê pêk hatiye. Armanca me ji vê hemleyê rizgarkirina tiştê maye ji xaka başûrê rojhilatê Hesekê ye.
Pêngava me ya Bagera Cizîrê ji ber êrîşên Artêşa Tirk û çeteyên wê ya li ser kantona Efrînê hatibûn rawestandin. Lê hêzên me QSD 1'ê Gulana derbasbûyî careke din dest bi pêngavê kirin.
Di çarçoveya qonaxa duyemîn a pêngavê de hêzên me pêş ketin û herêmek berfireh ji xaka ku gundê Baxoz jî di nav de rizgar kir. Ev pêngava ku hêzên me ragihandiye bi armanca rizgarkirina tiştê maye ji gundên başûrê rojhilatê Hesekê û paqijkirina xeta sînorê me ya bi Iraqê re ye."

## NPG'ê gerîlayên li eyaleta Avaşînê pîroz kir

Fermandariya Biryargeha Navenda Parastina Gel hêzên gerîla yên eyaleta Avaşînê ji ber çalakiya 2'ê Hezîranê pîroz kir.
Fermandariya Biryargeha Navenda Parastina Gel bi wesîleya çalakiya 2'ê Hezîranê ya li eyaleta Avaşînê daxuyaniyeke nivîskî weşand.Peyama Biryargeha Navendî wiha ye:
"Hêzên mêtinger ên Tirk ku dixwazin çar aliyên welatê me dagir bikin, hewl didin li her derê rê çêbikin û bi vî rengî dagirkerî û serweriya xwe zexm bikin. Li dijî hêzên leşkerî yên ku bi vê armancê ji Girana heta çiyayê Govendê rê çêdikirin, hêzên we yên eyaletê roja 2'ê Hezîranê çalakiyek kirin. Ev kemîna ku baş hatiye amadekirin, di warê cih û demê de çalakiyeke serketî ye.
Ji ber vê çalakiya serketî, em hemû hevrêyên tevlî çalakiyê bûn, di şexsê fermandariya we de hemû hêzên li eyaleta we pîroz dikin û hêvîdar in ku hûn ê timî serketî bin. Em we, hemû hevrêyên di vê çalakiyê de keda xwe hene û hemû hêzên we yên eyaletê silav dikin. Li dijî hêzên dagiker ên Tirk ên qirker, mêtinger û faşîst, di têkoşîna şoreşgerî de em ji we re serketinê dixwazin."



## Demîrtaş wê civîneke çapemeniyê pêk bîne

Namzetê HDP'ê yê Serokkomariyê Selaheddîn Demîrtaş wê li ser medya civakî civîneke çapemeniyê li dar bixe.
Li gorî agahiyên ku ji aliyê HDP'ê ve hatin dayin, 6'ê Hezîranê roja Çarşemê saet 23:00 pirsên li ser Twitter, Instagram û Facebookê li etîketên #DemirtaşaSoruyorum, #AskDemirtas ya jî #JiDemirtaşDipirsim werin nivîsandin wê bên hevdan û ji Demîrtaş re bên ragihandin.
Demîrtaş jî wê li ser hesabê xwe yê Twitterê 8'ê Hezîranê roja Înê bersivê bide pirsan.
Bersivên Demîrtaş her wiha wê li ser hesabên Selahattîn Demîrtaş ên Facebook û Instragramê jî bên weşandin. Yên bixwazin dikarin pirsên xwe bi dîmen jî bikişînin. Ev pirs jî wê bi rengekî nivîskî bigihêjin ber destê Demîrtaş.




## Divê kongreya çareseriyê were lidarxistin

Eniya Demokratîk a Sûriyê û Partiyên Kombûna Demokratîk a Çepgir ên Kurdên Sûriyê diyar kirin ku pêwîste yekîtiya xaka Sûriyê were parastn û kongreyek niştimanî ya Sûriyê ji bo çareserkirina aloziyê were lidarxistin.
Şandeyek ji Eniya Demokratîk a Sûriyê bi partiyên kurdî yên bi di bin banê Kombûna Demokratîk a Çepgirên Kurd ên Sûriyê hatine gel hev re, civiyan. Hevdîtin li navena Partiya Veguhertina Demokratîk a Kurdistanê ya Sûriyê ya bajarê Qamişlo pêk hat. Şandeya Eniya Demokratîk ji aliyê Sekrterê Partiya Kesk a Kurdistanê Luqman Ehmê, ve hate pêşwazîkirin.
Herdû aliyan nerînên xwe yên derbarê aloziya Sûriyê parve kirin û destnîşan kirin ku divê hêzên siyasî yên Sûriyê yekîtiya xaka Sûriyê biparêz in.
Sekreterê Eniya Demokraîtk a Sûriyê Mihemed Merî diyar kir ku hevdîtina wan bi armanca yekîtiya opozisyona hindir pêk hatiye û destnîşan kir ku divê kongreya niştimanî ya Sûriyê-Sûriyê were lidarxistin. Di riya wê kongreyê de aloziya Sûriyê were çareserkirin.
Endamên Şandeyê her wiha êrîşa dewleta Tirk a dagirker şermezar kirin. Endamên şandeyê ezmûna Rêveberiya Xweseriya Demorkatîk a Rojava-Bakurê Sûriyê ecibandin û destnîşan kirin ku ev sîstem xizmeta berjewendiya gelê kurd û hemû gelê Sûriyê dike.



# Mîhrîcana zarokan bi dawî bû

***Yekemîn Mîhrîcana Zarokan a Amedê ku di 27'ê gulanê de bi pêşengiya Şanoya Bajêr a Amedê dest pê kir, bi lîstîka "Sê Ezezok" bi dawî bû. Koordînatorê mîhrîcanê Yavuz Akkûzû axivî û diyar kir di rojên pêş de têkildarî mîhrîcanê wê daxuyanike berfireh bidin û raporekê jî biweşînin.***

Yekemîn Mîhrîcana Zarokan a Amedê ku di 27'ê gulanê de bi pêşengiya Şanoya Bajêr a Amedê dest pê kir, bi lîstîka "Sê Ezezok" bi dawî bû.

Yekemîn Mîhrîcana Zarokan a Amedê ku di 27'ê gulanê de bi pêşengiya Şanoya Bajêr a Amedê dest pê kir bi dawi bû. Mîhrîcan ji 2 beşan pek dihat. Di beşa yekemîn de ji bo zarokan perwerdeya mîm, drama, kûkla û hunerê hat dayîn. Di beşa yekemîn de zarokan gelek berhem hilberandin. Di beşa duyemîn de jî berhemên ku ji aliyê zarokan ve hatibûn amadekirin, hatin pêşkeşkirin û ji aliyê Orkestraya Zarokan a Ma Musicê ku ji sed zarokî pêk tê ve jî konserek hat dayîn.

Her wiha di beşa duyemîn de ji bo zarokan 5 lîstikên şanoyê hatin nîşandan û semînerek hat lidarxistin. Derbarê mîhrîcanê de koordînatorê mîhrîcanê Yavuz Akkûzû axivî û diyar kir ku wan bi mîhrîcanê re, ji zarokên Amedê alternatîfek afirandiye. Akkuzu got: "Ji sedî 90'ê lîstikên ku hatin lîstin û konsera ku hat pêşkeşkirin, bi kurdî bû. Bi saya mîhrîcanê zarokên Amedê ji çanda xwe haydar bûn." Akkûzû her wiha destnîşan kir ku dê di rojên pêş de têkildarî mîhrîcanê daxuyanike berfireh bidin û raporekê jî biweşînin.



## Seherê bi kurdî bixwînin




Wergera bi kurdî (kurmancî) ya pirtûka çîrokan 'Seher' a namzedê serokkomariyê yê HDP'ê Selaheddîn Demîrtaş ku li Girtîgeha Tîpa F a Edîrneyê nivîsandibû, derket. Seher bi wergera helbestkar û rojnamevan Rêdûr Dîjle ji Weşanxaneya Aramê derket. Seher ji 12 çîrokan û pêşgotina Demirtaş pêk tê.

Demîrtaş, di pêşgotina wergera kurdî ya Seherê de diyar dike ku dê bi dahata pirtûkê piştevaniya wêjevanên kurd bê kirin û wiha dibêje: "Ger we versiyona tirkî ya pirtûkê standibe jî ji bo destekirina wêjeya kurdî teqez kurdiya wê jî bistînin, bixwînin û bidin xwendin."

Pêşgotina ku Demîrtaş ji bo wergera kurdî ya Seherê nivîsandiye wiha ye:

"Ji ber barê wergerandina pirtûka ku min li girtîgehê nivîsand girtin ser xwe û wergerandin zimanê min ê zikmakî kurdî, ji dil û can malavayiya Weşanxaneya Aramê û hevalê xwe yê wergêr Rêdûr Dîjle dikim.

Dil dixwest ku min bi zimanê xwe yê kurmancî an jî dimilkî binivîsandana. Lê belê wekî kurdekî nesîbê xwe ji asîmîlasyona ku parçeyekî ji qirkirina çandî ya li ser gelê kurd e wergirtiye, mixabin ev yek ne pêkan bû. Lewma ev werger kêmasiyeke min a mezin temam dike û min rûmetyar dike.

Hîn jî baş nikarim bi zimanê xwe yê zikmakî biaxivim. Di vî warî de helbet gelek kêmasiyên min jî hene. Lê ligel her tiştî jî diviya ku min ji bo hînbûn û pêşvexistina zimanê me yê zikmakî, baş hewl bidaya. Hêvîdar im ku di vî warî de ciwanên kurd min esas negirin.

Lê dîsa jî wergera kurdî ya pirtûkê ez pir kêfxweş kirim. Dê dahata vê pirtûkê ji bo Weşanxaneya Aramê be û dê piştgiriya wêjevanên ku bi kurdî dinivîsin bê kirin. Eger we versiyona tirkî ya pirtûkê stendibe jî, lê ji bo destekirina wêjeya Kurdî teqez Kurdiya wê jî bistînin, bixwînin û bidin xwendin. Careke din mala hemû kesên ku ked dane ava be."

## Sênî û zerf gelan tîne cem hev



Her çendîn dagirker dixwazin pêkhateyên bajarê Kerkûkê ji hev dûr bixin û bînin li hemberî hev gelên Kerkûkê bi lîstika sênî û zerf di meha remezanê de tên cem hev û vê lîstikê dilîzin.

Şevên Remezanê û piştî nimêja terawîha, li Kerkûkê kurd, Ereb û Tirkmen ji bo lîstina lîstika sênî û zerf têne gel hev.

Emîr Elî Ehmed yê ji netewa Ereb û xelkê Kerkûkê ye, têkildarî lîstika sênî û zerf wiha got: "Em îro li taxa îmam Qasmîn lîstika sênî û zerf dilîzin. Hemû pêkhateyên Kurd, Tirkmen û Ereb tevlî vê lîstikê dibin. Ji bo xelkê Kerkûkê di meha remezanê de lîstika sênî û zerf xwedî cihek cuda ye. Em li vir bi hev re dijîn. Kurd, Ereb û Tirkmen hemû weke bira ne."

Xwediyê xwaringehê Hejar Ehmed yê ji Kerkûkê ye diyar kir ku lîstika sênî û zerf lîstikeke kevn e û wiha axivî: "Bi salane ev lîstik li bajarê Kerkûkê tê lîstin. Lîstik ji 6 kesan pêk tê û ew jî dibin du kom. Kîjan kom winda bike, pereyê hemû tiştên di dema lîstikê de hatine xwarin dide."

Welatiyek din ê bajarê Kerkûkê Tariq Ebas jî diyar kir ku heval û dostên xwe ji bajarên cuda vedixwînin ji bo vê lîstikê. Tariq Ebas got ku gelek caran ew ji bo bajarên cuda jî tên vexwendin ku li wir dilîzin.

**LÎSTIK ÇAWA TÊ LÎSTIN**

Lîstîka sênî û zerf ji 11 zerf û sîniyekê pêk tê. Destpêkê gustîlek datinin nava zerfekê û ji aliyê koma yekem ve li pişt perdeyek reş tê danîn. Piştre jî li sêniyê tê xistin, ji bo neyê zanîn ew gustîl li nav kîjan zerfî de ye. Piştre sênî bi 11 zerfan ve tê danîn ber destê koma duyemîn. Koma pêşber ji bo dîtina zerf mafê wê heya ku du peyvên gul ji bo peydakirina gusttîlê bikar bîne.

## Li Tebqa wê navenda çandê bê vekirin



Komîteya Çand û Hunerê ya Rêveberiya Sivîl a Demokratîk a herêma Tebqayê xebatên sererastkirina Navenda Çand û Hunerê ya li taxa duyemîn a bajarê Tebqayê didomîne û amadekariya merasîma vekirina navendê dike.

Ev nêzî 3 meh in xebatên sererastkirina navenda Çandê ya bajarê Tebqayê berdewam dikin, bi taybetî ji ber ku di encama hovîtiya komên çete yên cûda de di serdemên borî de rastî gelek ziyanan hatibû. Di serdema çeteyên DAÎŞ'ê de jî navend weke baregeheke çeteyan dihat bikaranîn û têde lêpirsîn û îşkenceya welatiyan dihat kirin.

Niha gelek xebatên sererastkirinê hatin pêkanîn û derî û pencereyên navendê hatin siwarkirin û toreya wê ya av û elektrîkê hate sererastkirin.

Di qonaxa yekemîn a sererastkirina navendê de li şûna şanogeha navendê ku bi temamî hatiye hilweşandin, dikeke nû ya şanoyan hate çêkirin.

Girêdayî mijarê Endamê Rêveberiya Têkliyên Giştî ya Komîteya Çand û Hunerê Mesna Ebdilkerîm diyar kir ku niha ew li benda merasîma vekirina navenda çandê ne ku tê payîn di nîvê meha Hezîranê de pêk were û di merasîmê de dê gelek çalakiyên çandî bêne pêşandan…*ANHA*

## Ji Nazim ji bo kurdan nameyek

Helbestkarê mezintirîn ê zimanê tirkî Nazim Hîkmet ku bi nasnameya xwe ya çepgir û şoreşger jî tê naskirin 55 sal e ku koça xwe ya dawîn kiriye. Helbestên wî li dora 40 zimanan hatine wergerandin. Nazim li dû xwe bi sedan helbest, pexşan, metnên şanoyê hiştin û di 3'yê hezîrana 1963'yan de li derveyi welat çû ser dilovaniya xwe.

Nazim di helbestên xwe de bi piranî li ser evînê, li ser dostaniyê, li ser hesreta welat, li ser azadiyê û gelek jî li ser şoreşê û rizgariya mirovan nivîsiye. Heta li ser şoreşa gelên Ewropa, Afrîka, Çîn, Kuba û Endonezyayê jî helbest û gotar nivîsîne. Lê sed mixabin di nav kulliyata helbest û nivîsên wî de mirov rastî kurdan û şerê wan ê azadiyê nayê. Herçî kurd in di navbera 1920 û 1930'an de hem li Tirkiyê, hem jî li Îran û Iraqê ji bo îstîqlala xwe û ji bo hebûna xwe şer dikin û li ber xwe didin.


Nazim Hîkmet ê ku serê wî tim bi rejîma tirk re di belayê de bû û heta dema çû sirgûniyê 17 salan li zindanan girtî ma jî êş û azarên gelê kurd nebû mijara hunera Nazim. Lê nameya ku ji nav arşîva Mîr Kamuran Bedirxan derketiye, nîşan dide ku Nazim hem kurdan nas dike û hem jî



doza jiyana wekhev û azad a kurdan dike.

Kovara Hêvî ku di bin banê Enstîtuya Kurdî ya Parîsê de di salên 1980'yî de weşanê dikir di hejmara xwe ya 1'em de ( Îlona 1983) bi pêşek û wergera Kendal (îhtîmal e ku Kendal Nezan be) nameya Nazim a ji bo Mîr Kamuran Bedirxan re weşandiye…

***Remezan Olçen-AMED***



## Rîskên Mezin

Medeni FERHO

Li Tirkiyê, naqosa rîskên mezin lê dide û ji bo Kurdan jî şiyarî ye...

Li Tirkiye hilbijartin hene. Ev hilbijartin dikare xêrê jî, şerekî mezintir jî bîne. Rêveberên Tirk, xêrê di şer de dibînin. Lewma rîsk mezin e.

Du enî li dijî hev têkoşînê dikin. Eniyek şerxwaz û nijadperest e, eniya din jî ya demokrasî û edaletê ye. Eniya şerxwaz, blok ava kirine. Rengê wan, gotinên wan ji hev cûda bin jî, armanca wan yek e. Eniya azadî, edalet û demokrasî jî, bi gelan re hevkariyê dike.

Eniya şerxwaz, bi pêşengiya Erdogan, di mitinga "Yenîkapi" de, li Stembolê, xewnên utopîk avakirin. Encam jî bû şerê li dijî gelê Kurd û gelên din, tixub jî derbas kirin. Li Rojava-Bakurê Suriye, li Başûrê Kurdistanê dagirkerî dane dest pê kirin.

Hilbijartin, rêbazek ji ya demokrasî ye. Lê gelek caran, hilbijartin dibe meşrûkirina faşîzmê. Hilbijartina îro li Tirkiyê jî, ji bo meşrukirina faşîzmê ye. Bi pêşengiya gelê Kurd-HDPê, gelên din jî dixwazin, hilbijartinê bikin hêviya serketinê. Lê metirsiyek mezin heye.

Li Tirkiyê her dem faşîzm heye, (veşartîvekirî) û mafê jiyanê nedaye gelan. Ji bo ku teqînên volqanî çênebin, civak kiriye bin zext zorê. Faşîzma Tirkî, îro vekirî ye, zext û zora li dijî hêza dînamîk ya Kurdan didomîne; li dijî gelê Tirk jî bi behaneya "feto" kiriye pratîkê.

Serkêşê faşîzma Tirkî Erdogan, xewnên utopîk ava kirin; lê îro, ew bi xwe jî di geliyê kûr de ye û xewnên têr kabûs û têba dibîne. Êdî dibîne ku dagirkeriya li derî tixubên Tirkiyê, bi taybetî dagirkirina Efrînê serketinek "pîrûswarî" ye.

Reaksiyon mezin e, krîz jî dijwar in. Muxalefet tenê HDPê ye, cîhan jî lîstika 3 meymunan dilîze.

Balkêş e, gelên Tirkiyê xwedî tecrube ne û "faşîzma tirkî" veşartî û eşkere baş nas dikin. Baş zanin ku, faşîzma tirkî, her dem xewnên utopîk-afirgeriya civakî kor û kerrende kiriye. Dikê bin zeptûreptê; cerdevanên bi krawat û bi çek rêxistinî dike. Îro jî, faşîzma tirkî, ne tenê li Bakur, li Başûr, Rojava, Bakurê Suirye êrîşî Kurdan-gelan dike.

Gelo ev hilbijartin, wê dikaribe, "sêva sor" ku di dagirkirina Efrînê de rûdêna xwe ya reş şanî cîhanê da têk bibin? Erê şanî cîhanê da, lê rîtalên ku li Dilokê bi pêşengiya MÎTê li hev rûniştin, dagirkirina Efrînê meşrû kirin, gelo wê rastiyê bibînin? Hemberî ku civîna wî "guruhî" bi "zirta" zirnê û "zîqên"a kemançê tê binavkirin jî, metirsî ye.

Faşîzma AKP-MHPê jî, sendoqên li Bakurê Kurdistanê li yek cihî kom dike; ji bilî HDPê, kes dengê xwe dernaxist. Blokên hatina ava kirin, gelo çima dengê xwe dernexistin? "Sahîh"e ku Erdogan, faşîzma dewletê temsîl dike û argumantên ji bo demokrasî û guhertina civakî ji holê rakirine kirine. Rewşa awarte heye û nanzêdê HDPê yê Serokkomariyê Selahaddîn Demîrtaş girtî ye. Hêviya ji namzêdên nijdaperest jî, xewna li geliyên kûr e.

Bêguman, hêvî yekîtiya gelan e. Lê, divê pêşî yekîtiya Kurdan werê ava kirin, da ku gelê din, xwe li dora wan bidin hev. Divê, di serî de PDKe û YNKe xwe dibin çavan re derbas bikin û ji bo yekîtiya neteweyî gavan biavêjin. Esseh û teqeze! Şerê 3, yê cîhanê, piştî dagirkirina Efrînê, piştî hilbijartinên li Iraq û Başûr, piştî helwesta Emerîka-Israîl li dijî Îranê, ketiye qonaxeke din. Divê Kurd, pencereyên mêjiyê xwe baş vekin. Faşîzma Tirkî, ne tenê Kurdan dikuje, ciwanên Tirk jî dikuje. Divê gelê Tirk jî, rekiha nijadperestiyê bişikîne.

# Koperatîfa hevjînên şehîdan hate avakirin

***Saziya Malbatên Şehîdan a herêma Minbicê ji bo avakirina koperatîfên taybet ji bo hevjînên şehîdan, li hola civînan a Meclîsa Zagonsaz civînek li dar xist. Piştî civînê ji bo hevjînên şehîdan kooperatîf hat ava kirin. Her wiha di civînê rêziknameya kooperatîfan hat xwendin.***

Saziya Malbatên Şehîdan a Minbicê koperatîfa hevjînên şehîdan ava kir.

Bi tevlîbûna endamên Meclîsa Jin, Mala Jin a Minbicê û dehan hevjînên şehîdan, Saziya Malbatên Şehîdan a herêma Minbicê ji bo avakirina koperatîfên taybet ji bo hevjînên şehîdan, li hola civînan a Meclîsa Zagonsaz civînek li dar xist. Avakirina koperatîfan di çarçoveya pêkanîna biryarên Konferansa Hevjînên Şehîdan ya ku li Qamişlo di 5'ê Gulana derbasbûyî de hatibû li darxistin pêk tê.

Piştî deqeyek rêzgirtin, endama Koperatîfa hejvînên Şehîdan Xezel Hesen destnîşankir ku armanca avakirina koperatîfan naskirina pirsgirêkên hevjînên şehîdan, rêxistinkirin û pêşnûmekirina projeyan ji bo wan e.

Xezel Hesen got, hemî koperatîfên ku li herêmên Firat, Cizîr, Reqa, Efrîn û Şehba lêvegera wan Koperatîfa Îştar a li bajarê Qamişlo ye.

Piştî axaftina Xezal rêziknameya koperatîfê hate xwendin.

Li gorî biryarên Konferansa Malbatên Şehîdan, Koperatîf ji 19 rêveberan pêk tê, armanca kopertatîfê ew e ku, asta hevjînên şehîdan ya zanistî bilind bike, hevjînên şehîdan rêxistin bike, ji bo wan perwerdeyên vekirî û girtî veke, dest bi pêngava fêrkirinê ji hemî jinan re bike.

Perwerdekirina zarokên şehîdan e, avakirina komîteyeke taybet ji bo çareserkirina pirsgirêkên wan, vekirina baxçeyên zarokan.




Her wiha Koperatîf bi hevkariya Kongereya Star û aliyên têkildar ve,vekirina cihên taybet ji bo zarokên astengdar li tevahiya bajêr, avakirina koperatîfên(dirutin, çandinî,xwedîkirina sawalan û hwd) armanc digire.

Hêjayî gotinê ye ku ev koperatîf li herêmên Bakurê Sûriyeyê, 5 hezar û 603 zarokên şehîdan, 2 hezar û 92 hevjînên şehîdan destek dike… *ANHA*

## Hîndekarî ji zaroktî des pê dibe





**Melek DEMÎRTAŞ**

Bexçê zarokan ango pêşdibistan saziyekî perwerdehiyê ye da ku zarok bi temnê biçûk ji malê derkeve û hînî rêbazê dibistanê bibe, her wiha pêwîste zarok ser rêbazek çandî û civakî bêne hînkirin. JI bo wê KPCD'ê Jin a Kantona Qamişlo bi mebesta şopandina xebata bexçeyên zarokan Rêvebiriya Bexçeyên zarokan avakir.

RÊVEBERÎ AVA BÛ

Têkîldarê mijarê Rêvbira Bexçê zarokan Viyan Isa ser armanca avakirina bexçeyên zarokan ev agahî da: "Di demasla xwendina 2017 û 2018'an de KPCD'ê JIn a bajarê Qamişlo li avahiya xwe Navenda Rêvebirina Bexçê zarokan vekir. Viyan wiha dom kir: "Ji bo ku em rewşa bexçe û mamosteyan bizanibin me serdana bexçeyên taybet kir da ku desturnamyên xwe ji me bigrin. berê bexçê zarokan ser sê beşan dihate dabşkirin wekî bexçêyên girêdayî Desteya Jin, Weqfa Jin û Şaredeariyan da ku ev hemû û yên taybet bikevin çavdêrî ango sîwana KPCD'ê jin de ne û hemû pêdîviyên bexçe û mamosteyan pêşkşê dikin."

### ARMANC BEXÇEYAN JÎ BAZRİGANİYÊ DERXÎNİN

Viyan da zanîn ku perwerde ji mamosteyên bexçeyan re didin û wiha got: "Ji bo qonaxa hînbûn û naskirina zarokan ji bexçê re em pîlaneke tekane li gora rewşa her zarokekî datînin, çi di riya çîrok, şano û lîstokan de didin zarokan. Da ku bi rengekî ne ezber bi piratîkî hîn bibin. Bi vê mebestê 5 mamostan wekî komisyon tê perwerdekirin da ku heman rêbaz bidin mamosteyên bexçeyan jî. JI ber ku armanca me bexçê zarokan ji çarçoveya bazirganiyê derxînin û bingeha avakrina Rêvebiriya Bexçeyan ku em nifşên nû ser rêbazên Netewa demokratîk perwerde bikin, ji bo wê jî ser zarokekî tenê hezar lîreyî distînin."


### MAMOSTE Dİ HAVÎNÊ DE PERWERDE DİBÎNİN

Meteryalên ku di bexçeyan bi zimanê kurdî û Erebî tê dayîn Viyan diyar kir ku mamoste ser rêbazên çawaniya danûstandin û meteriyal di demsala havînî de perwerdê didin wan ku ji destpêkê vekirina Navenda Bexçê ev du perwerde bi dawî kirin. Piştî cejna remezanê wê hijmarek ji mamostê ser biranşên ku KPCD'ê Jin ji mamosteyên bexçan re amdekariya pedegojî û ziman ser mehekê û girtî bên perwedekirin."

### 4 DİBİSTANAN AMEDE DİKİN

Rêvebira Bexçê Zarokan Viyan Isa di dawî got: "Di dibistanên ku valatî hebin dê bexçeyên zarokan avabikin. Ku heya niha 4 dibistan li gorî pîvanên bexçeyan amede dikin."

## Li Efrînê ewlehî û aramî tune ye



Dewleta Tirk a dagirker û çeteyên wê hewl didin ku dagirkeriya xwe ya li Efrînê rewa nîşan bide. Ji bo vê yekê hemû rê û rêbazan bikar tîn in, çete welatiyan neçar dikin ku bi xizmên xwe yên li derve re biaxivin û ji wan re diyar bikin ku li Efrîn aramî û ewlekarî heye. Armanca wan jî dema welatî vegerin zilm û zordariyê li ser wan bimeşîn in.

Welatiyê ji Efrînê yê bi navê M.E. yek ji hezaran kesên bûn qurbaniyê siyasetên Artêşa Tirk û çeteyên wê. Hin ji xizmên wî di bin zexta çeteyan jê re gotin ku Efrîn arame û ew jiyanek bi ewle jiyan dikin. Li ser vê yekê biryar da ku vegere Efrînê, bi taybet ji ber ku hejmarek mezin ji xizmên wî nikarîbûn ji Efrînê derkevin.

Lê dema vegeriya ew matmayî ma. M.E. tenê sê rojan li Efrînê ma, di wan sê rojan de pê hesiya ku ew ketiye planên şerê taybet ku dagirkeriya Tirk û çeteyên wê li dijî wan bikar tîne.Tenê bi gotina ku "Bîna aştiyê li Efîrnê nîne" hestê xwe derbarê sê rojên li Efrînê jiyan kir anî ziman.

Welatiyê bi navê M.E. ji ber wan kiriyaran biryar da ku ji Efrînê derkeve. Derbarê wan sê rojên li Efrînê ma ev tişt anî ziman: "Dema ez gihiştim Efrînê, min Efrîn wekî berê ne dît. Heta bîna wê biyanî bû. Tu li kur dinere tu çeteyan dibîne. Pereyan ji mirovan dixwazin û êrîş dikin. Çete dikarin her tiştî bikin, bê yî tu kes parastina xwe jî bike."

M.E. destnîşan kir ku tirs li ser riwê hemû welatiyên di Efrînê mane de diyar e. Nikarin emlakên xwe biparêz in û wiha dom kir: "Kesên dixwazin dikanên xwe vebikin, dibe ku rojekê were bibîne tiştek di dikanê de nîne. Dema kesek li gel çeteyan xebitî heqdestê wan nadin, tu nikare ji wan bixwaze jî. Ji bilî şerê navxweyî yên di nava çeteyan de li kolanan her diyar e, tu kes nikare tevî malbata xwe dakeve kolanê. Rojane tu dibîne ku çete çawa êrîşî ciwanan dikin."

M.E her wiha destnîşan kir ku çete kengî dixwazin digirin ser malan û wiha direjî da axaftina xwe: "Dema ez li wir bûm, min dît çawa di saetên sibê de li taxa Mehmûdiyê girtin ser malan û zêdeyî 150 welatî revandin. Di bin dagirkeriya çeteyan de jiyan li Efrînê nabe. Tu nizane kengî tê were revandin an were kuştin."

Welatiyê bi navê M.E di dawiya axaftina xwe de bang li hemû welatiyên Efrînê kir ku ji rêbazên şerê taybet ê Artêşa Tirk û çeteyên wê hişyar bin û bawer nekin ku aramî û ewlekarî li Efrînê heye… *ANHA*

## Ciwanên Başûr wê bimeşin Qendîlê

Li navenda Komeleya Ciwanên Welatparêzên Kurdistanê ya Silêmaniyê, Komeleya Ciwanên Welatparêzên Kurdistanê û Rêxistina Jinên Ciwan ên Têkoşer bi daxuyaniyekî hevbeş ragihandin ku wê di qonaxa duyemîn a 'Serî Hilde' de ber bi Qendîlê ve bimeşin. Daxuyanî ji aliyê endamê Komeleya Ciwanên Welatparêzên Kurdistanê Wilyat Berzencî ve hate xwendin. Di daxuyaniyê de wiha tê gotin; "Ji berî niha ciwanan dest bi pêngava 'Serî Hilde' kirin ku 6 mehan berdewam kir. Bi serketî bû. Emê dîsan li dijî dagirkeriyê dest bi pêngavê bikin. Ji ber ku li dijî dagirkeriyê hikûmeta Herêma Kurdistanê bê helweste û heya niha têkildarî dagirkeriya dewleta Tirk de çi daxuyanî nedaye."

Di dawiya daxuyaniyê de wiha tê destnîşan kirin; "Di roja 5'ê Hezîranê de di saet 21:00'an de ji hemû navendan emê meşên meşayî lidar bixin. Her wiha emê di roja 8'ê Hezîranê de di saet 08:00'an de, li Parka Nalî ya Silêmaniyê ber bi Qendîlê ve rê dikevîn û di heman rojê de li Qendîlê di saet 13:00'an de emê dest bi meşê bikin."



# Dengên li Ewropayê diyarker in

***Hevseroka Konseya Rêveber a KCK'ê Besê Hozat bang li dengdêrên li Ewropayê kir ku dengê xwe bidin û got, "Dengên li Ewropayê girîng e û diyarker e. Li Ewropayê serjimara Kurd û Elewiyan gelek e. Kurd, Elewî û rewşenbîrên ji neçarî çûne Ewropayê dikarin planên faşîzma AKP-MHP'ê têk bibin."***



Hevseroka Konseya Rêveber a KCK'ê Besê Hozat bang li dengdêrên li Ewropayê kir ku dengê xwe bidin û got, "Yekane partiya ku dikare desthilatdariya faşîst a AKP-MHP'ê hilweşîne, HDP ye."

Hevseroka Konseya Rêveber a KCK'ê Besê Hozat diyar kir, Kurd, Elewî û rewşenbîrên ji neçarî çûne Ewropayê dikarin planên faşîzma AKP-MHP'ê têk bibin.

Hozat ji bo akademîsyen û rewşenbîrên li Ewropayê got, "Ji bo Tirkiyeke azad û demokratîk, li ku dera dinyayê dibin bila bibin, têkoşîn, xwedîderketina li nirxên însaniyet û demokrasiyê, ji bo rewşenbîr û siyasetmedarên Tirkiyeyî erka sereke ye."

Besê Hozat işaret bi sazûmankirina faşîzma AKP-MHP'ê kir û got, "ev dîktatorî dixwaze qirkirina Kurdan bibe serî."

Hozat ev bang li dengdêrên li Ewropayê kir: "Ev dîktatoriya faşîst eger di hilbijartinên 24'ê Hezîranê de bi ser bikeve, di serî de Kurd, Elewî û jin, zerareke mezin wê li hemû nasnameyên me bibe.

Lewma eger di hilbijartinên 24'ê Hezîranê de HDP ji bendê derbas bike, rejîma faşîst a AKP-MHP'ê wê di dîrokê de derba têkçûnê ya herî mezin bixwe, ji textê xwe serberjêr bikeve xwarê. Ev rewş li Tirkiyê wê meydanê ji demokrasiyê re veke. Bibe destpêka pêvajoyeke nû.Lewma, dengên li Ewropayê girîng e û diyarker e. Ji bo ku HDP ji bendê bibihure, pêdiviya wê heye bi dengê gelê me yê li Ewropa, bi dengê dostên Tirkiyeyî û welatiyên Tirkiyeyê yên ku alîgirê demokratîkbûna Tirkiyê ne.

Li Ewropayê jî bijîn, her mirovê ku dixwaze Tirkiye azad, wekhev û demokratîk be dengê xwe bide HDP'ê. Li Ewropayê serjimara Kurd û Elewî gelek e. Rejîma faşîst a AKP-MHP'ê Kurdan û Elewiyan dixe ber qirkirinê. Eger di hilbijartinan de bi ser bikeve, dixwaze vê qirkirinê bibe serî.

Lewma mirovên Kurd û Elewî divê teqez biçin ser sindoqan, dengê xwe bidin HDP'ê û di hilweşandina desthilatdariya faşîst de bi dewra xwe rabin."

## Pirsgirêkên jinên koçber tên çareserkirin



Mala Jin a kampa El-Tiwêhîne ya gundewarê bakur-rojavayê Tebqayê ji bo başkirina rewşa jinên koçber di kampê de xebatên xwe berdewam dike û di van rewşên dijwar de kar ji jinan re peyda dike.

Mala Jin a kampa El-Tiwêhîne beriya nêzî 4 mehan hate vekirin û ji wê demê ve hewl dide rewşa jinên koçber ên di kampê de baş bike.

Mala Jin di hundirê kampa El-Tiwêhîne de ji 10 xebatkarên jin pêk tê û perwerdeyan ji jinan re organîze dikin.

Endama Rêveberiya Mala Jin a kampa El-Tiwêhîne Sîham El-Hesen El-Şewax derbarê kar û xebatên xwe de wiha got: "Armanca me alîkariya bi jinên koçber re ye da ku rewşa wan baştir bibe û hemû pirsgirêkên jinên koçber di aliyên madî û manewî de bêne çareser kirin. Em derfetên kar ji jinan re di hundirê kampê de peyda dikin."

Girêdayî kar û xebatên Komîteya Lihevanînê ya Mala Jin Sîham diyar kir ku wan bêtirî 100 pirsgirêkên jinan ku piraniya wan girêdayî hevseran bûn çareser kirine.

Sîham da zanîn ku wan di kampê de kargeheke dirûtinê ji jinan re vekirine da ku jinên koçber karibin debara xwe werbigirin û got: "Bi hevkariya Meclîsa Jin a Tebqa û El-Curniyê me di kampê de kargeheke dirûtinê vekir da ku jinên koçber karibin di aliyê aborî de debara xwe bikin."…*ANHA*

## Li Şengalê xebatên jinan yên xwe birêxistinkirînê

Jinên Şengalê di her qadên jiyanê de xwe bi rêxistin dikin. Ji aliyê TAJÊ ve li Şengalê firin hat vekirin û di firinê de sê jin dixebitin.

Ji aliyê Tevgera Azadiya Jinên Êzidî (TAJÊ) li Şengalê firina jinan hat vekirin. Jinên ku di firinê de dixebitin diyar kirin ku ew ê wekî jinên Şengalê çalakbûyin û têkoşîna xwe ya di her qada jiyanê de bidomînin.

Jina bi navê Merkas Xelef diyar kir ku ew bi kêfxweşiyek mezin di firinê de dixebite û got: "Em wekî jinên Şengalê dikarin di her qada jiyanê de xwe bi rê ve bibin. Ji bo em neyên çewisandin divê em her dem çalak bin. Cihê jinê ne tenê li mal e jin li qadên jiyanê dikarin bixebitin û xwe bi rê ve bibin."

### DIVÊ JIN LI SER PIYÊN XWE BISEKINE

Deliya Xelef jî wiha got: "Dema ku ez dîbinim jinên Şengalê di her qadên jiyanê de çalak in û berxwe



didin ez gelekî kêfxweş dibim. Ez dixwazim di her gund û bajarî de jin di warê xebatê de cihên xwe bigirin û pêş bikevin. Divê jin di her warî de ber xwe bidin û pêdiviya wan ji kesekî din nemîne. Em sê jin di firinê de bi awayekî wekhev dixebitin û berxwe didin. Ez pêşniyar dikim ku hemû jin bixebitin û li ser lingên xwe bisekinin."

Eliya Merwan jî kêfxweşiya xwe wiha anî ziman: "Berî fermanê cihên kar ên ji bo jinan tune bû lê niha hene û jin bi kêfxweşî dixebitin. Ez bang li hemû jinan dikim ku hemû vegerin ser axa xwe û ji dil û can bixebitin û axa xwe hembêz bikin."*JINNEWS*

## Jin xwe ji bo Festîvala Sakîne Cansiz amade dikin

Jinên ku dibêjin "Cîhan wê bi têkoşîna Sarayan bixemile" xwe amade dikin ku di Festîvala 5. a Sakîne Cansiz de li bajarê Zurîch ê Swîsreyê li hev bicivin.

Festîvala Jinê ya Sakîne Cansiz ji bo bîranîna şoreşgerên Kurd ên 9'ê Çileya 2013'an li Parîsê hatin kuştin; Sakîne Cansiz, Fîdan Dogan û Leyla Şaylemez bi rengekî kevneşop her sal li Swîsreyê tê li darxistin. Festîvala îsal ku cara 5'an de wê pêk were, 10'ê Hezîranê roja Yekşemê li bajarê Zurîchê ye. Amadekariyên festîvalê qediyane.

### ŞÎDETA LI JINÊ Û BERXWEDAN

Li qada festîvalê wê kon bên vedan. Li aliyekî wê panelên li ser mijara "Şîdeta li jinê û berxwedan" bên lidarxistin, li aliyê din jî wê çalakiyên çand û hunerî pêk werin. Wekî din wê dengbêj jî dîwana xwe deynin. Ji bo zarokan jî bernameyeke taybet hatiye amadekirin ku bi lîstik û pêşbirkên cihêreng wê dilê zarokan bi festîvalê şa bibe.

### HATINEYA FESTÎVALÊ WÊ JI EFRÎNIYAN RE BÊ ŞANDIN

Hatineya festîvalê wê ji şêniyên Efrînê re bê şandin ku ji ber dagirkeriya dewleta Tirk û çeteyên wê neçar man Efrînê biterikînin û li herêma Şehbayê bi cih bibin. Li qada festîvalê wê ji bo Amedsporê jî standek bê danîn û lîstikvanê berê yê Amedsporê Denîz Nakî wê formayên kulûba xwe îmze bike. Hatineya ji vir jî wê ji Efrîniyan re bê şandin.

### HUNERMEND WÊ DERKEVIN SER DIKÊ

Tevî koma dengbêjan, koroya jinan, koma defê û komên govendê, wê gelek hunermendên Kurd, Swîsreyî, Îtalyanî û Fransî jî derkevin ser dikê. Wekî din jinên ji gelên cuda jî wê bi rengê xwe tevlî festîvalê bibin.

### JINÊN JI GELEMPERIYA CÎHANÊ WÊ LI WIR BIN

Festîvala ku di çarçoveya têkoşîna Sakîne Cansiz û hevrêyên wê de tê lidarxistin, her sal hinekî din enternasyonal dibe. Bandora Şoreşa Rojava û Têkoşîna Azadiyê ya Kurdan a li ser jinan, dike ku jinên ji nasnameyên cuda di Festîvala Sakîne




Cansiz de li hev bicivin.

### CÎHAN WÊ BI TÊKOŞÎNA SARAYAN BIXEMILE

Tevgera Jinên Kurd a Swîsreyê bang li hemû jinên li Swîsreyê kir ku bi rengê xwe tevlî festîvalê bibin. Di daxuyaniyê de hate gotin, "Em mesaja xwe ya 24'ê Hezîranê hemû bi hev re li qada festîvalê bidin. Em ji bîr nekin; cîhan wê têkoşîna Sarayan bixemile."

## Em ê dengê jinan bidin bihîstin



Pero Dundar a ji rêza duyemîn namzeta HDP'ê ya Mêrdînê ye, diyar kir ku wê dengên gelan bibin Meclîsê û wiha got: "Em ê zîhniyeta yek mêrî bişkînin. Em jin divê ji bo vê bixebitin."Xebatên hilbijartinê yên HDP'ê bê navber berdewam dikin. Pero Dundar a ji rêza duyemîn a HDP'ê ya Mêrdînê namzet e, di serî de di operasyonên di bin navê KCK'ê de sê caran hatiye binçavkirin û bi giştî 20 salên xwe di girtîgehê de derbas kiriye.

### EMÊ DENGÊ JINAN BIDIN BIHÎSTIN

Pero destnîşan kir divê di vê pêvajoyê de gel xebatên xwe heta dawî bimeşînin û wiha got: "Heta îro min çawa xebat meşandin ez ê ji vir şûnde jî bikim. Xebata qadê û siyaset ji hev ne cuda ne. Karê meclîsê yê esas jî ev e ku bi gel re be. Heta îro wisa bû. Kêmasiyên me jî çê bûn lê em heta vir hatin. Ji vir şûnde jî em ê bixebitin."

### HDP JI BO MECLÎSÊ ŞANSEKE

Pero di daxiya axaftina xwe de got: "Destûrek bingehîn a gel, jin û ciwan tê de tuneye, heye. Ji ber vê karê me zehmet e. Divê em pir bixebitin. Divê em jin zêdetir dengê xwe bilind bikin. Perspektîfa HDP'ê jî wisa ye. Reng û dengê gelan heye. HDP di parlamentoyê de şansek e."

Pero di dawiya axaftina xwe de got ew jin dibêjin ku divê jin di demokrasiya Tirkiyeyê de hebin û ji bo vê jî herî baş bi wan dikare bê guhertin û got: "Armanca me ev e ku tecrîda li ser Abdullah Ocalan demildest bişkê. Hawira aştiyek mayîn de bi azadiya Birêz Ocalan pêkan e."

## TJK'ê lez da xebatên hilbijartinê

Tevgera Jinên Kurd (TJK-F) li Herêma Champîngny-sûr-Marne ya başûrê rojhilatê paytexta Fransayê, li Parîsê lez da xebatên hilbijartinê.

Tevgera Jinên Kurd a Fransayê (TJK-E) bi beşdarbûna gelek kesan ji bo hilbijartinên 24'ê Hezîranê civîna gel lidarxist. Di civînê de stran jî hatin guhdar kirin.


Civîn ji bo bîranîna şehîdên têkoşîna azadî û şoreşê bi deqîqeyek rêzgirtinê dest pê kir. Piştre pêvajoya siyasî ya li Kurdistan û Tirkiyeyê hate nirxandin. Di civînê de qala komkujiyên jinan, dagirkeriya Efrîn, hilbijartin û nêzikatiya li beramberî jinê ya li Tirkiyê hate kirin.

Li aliyê din di civînê ji bo xebatên dengdayinê ku li Ewropa wê 7'ê Hezîranê dest pê bike, beşdarbûna bihevreçûyina konsolosxaneyê



biryar hate girtin.

Li aliyê din banga tevlîbûnê hate kirin ji bo 'Festîvala Jinên Cîhanê û Jinên Kurd a Rojbîn' ku wê di 17'ê Hezîranê de were lidarxistin. Civîn bi stranên hunermendê ciwan Diyar Mehrowî bi dawî bû.



## Buyîna pepûleya wî aliyê okyanûsan

Qasim ENGÎN

Cîhana me kaos ango aloziyek mezin dijî. Avabûn di kêliyên navbera kaosan de rû didin. Hêzên qaşo hegemonîk jî tam di van navberan de hewldidin guherînan ji bo berjêwendiyên xwe pêkbînin.
Em bizanin ku, di van kêliyan de tenê gavek di cih de dihêle ku bandorên gelek mezin bi xwe re bîne. Bi gotinek din, di kêliyên navbera kaosê de caran hejandina baskekê pepûleyekê li wî aliyê Çînê, dihêle ku vî aliyê Okyanûsa Atlantîkê de Tûsanamî rabin. Vê yekê jî him hêzên hegemonîk him jî hêzên dagirker dizanin.
Îro di Rojhilatanavîn de –bi taybet jî li Kurdistanê-em tam rewşek navbera kaosê de derbas dibin û dijîn. Bi gotinek din, li Kurdistanê de kêliyên avabûnek nû tên jiyîn. Gavên mezin yên ku di rastiya xwe de kesekî bawer nedikirin di rewşek wiha de hatin avêtin. Lê di heman demê de eger ewqasî êş, nakokî, alozî, tevlêhevî jî tên jiyîn, bi vê rastiyê ve girêdayî ne.
Erê, îro li Kurdistanê rojên çarenûsê tên jiyîn. Rojên tarî û rojên ku xwîna me dimêtin êdî derbas dibin. Bi gotinek din rojên azadiyê tên jiyîn. Vê jî herî zêde hêzên ku êş û elem li ser me ferzkirin e, hêzên mêtinger yên ku her roj em kuştin e dizanin.
Di van kêliyên dîrokî yên ku ketine destên me de -em bizanin ku ev kêlî her tim rû nadin- emê çawa tevbigerin?
Emê çawa bikin ku îcar xwe ji destên mêtingeran xelasbikin?
Çi pêwîste ku em wek gel di van kêlîyên dîrokî de bikin?
Serî de pêwîste em bizanin ku hêzên mêtinger jî dizanin îro em rojên dîrokî dijîn. Hêzên mêtinger jî dizanin ku ew pergala mêtingerî ya ku li ser me bi alîkariya hêzên hegemonîk hatibû ferz kirin, rojên xwe yên dawî dijîn. Hêzên mêtinger jî dizanin ku êdî zengilê azadiyê ji bo me lê dide. Lê berevajî ji bo wan ango hêzên mêtinger jî zengilê cihimînê lê dide. Rastiya ku îro tê jiyîn ev e!
Ewqas erîşên ser Kurdistanê, gelê me û gelên me ji bo vê ye. Ewqasî êşên ku em dikişînin ji bo vê ye. Ewqasî harbûyîna dewleta Tirk ji bo vê ye. Harbûyîna Baas ji bo vê ye. Ma li Efrînê çi hebû ku dewleta qirker-mêtinger ewqasî bi zulmek mezin erîş bike? Ewqasî nirxên dîrokî hilweşîne? Ewqasî bi demografyaya Efrînê bileyze?
Her wiha, ewqasî Rojava tehdît bike?
Ewqasî erîşan bibe ser axa Başûr? Ewqasî bi rêbazên hovane û dij mirovî biçe ser Cîzîr û Sûr?
Ewqasî nijadperestî bilind bike û êrîşî Kurdan, Ermenan, Suryanan, Êzîdiyan, Elewiyan û her wiha baskên ku guherîne dixwazin bike?
Yek sedemê xwe heye, ew jî; em di kêliyen berbanga azadî de ne. Em di kêliyên şikandina zincîra koletiyê a ku li stûyê me gerandin e.
Bi kurtahî, rojên azadî ji her demê nêzîktirin.
Tişta pêwîst ew e ku, em bizanin ka hejandina baskê pepûleyekê ji xwe re, ji me re çi tîne.
Bi hêviya ku herkes baskê xwe bihêjîne...

# 24'ê Hezîranê rojeke dîrokî ye

***Karasû wiha got, "Erdogan, AKP dixwazin sîstemeke olperest-neteweperest ava bike. Ji ber vê yekê, eger ev sîstem ava bibe wê zext û zordariya li ser hêzên demokrasiyê, li ser hêzên gel, li ser***



Endamê Konseya Rêveber a KCK'ê Mûstafa Karasû got, "Hilbijartinên 24'ê Hezîranê gelekî girîng in. Eger AKP-MHP bi ser bikevin wê sîstema olperest-neteweperest mayinde bibe. Divê bi têkoşîna demokrasiyê pêşî li vê bê girtin."
Endamê Konseya Rêveber a KCK'ê Mûstafa Karasû girîngiya hilbijartinên 24'ê Hezîranê ji bo gelê Kurd û hêzên demokrasiyê ji ANF'ê re nirxand.
Karasû diyar kir ku tifaqa faşîst a AKP-MHP'ê ji ber sedemên cidî yên aborî, siyasî, dîplomatîk û civakî biryara hilbijartina pêşwext da û destnîşan kir ku yek ji sedemên girîng ên dayina biryara hilbijartinê, polîtîka şer a şefên faşîst ên desthilatdariya AKP-MHP'ê ye.
Karasû got, "Hîn jî dibêjin 'Em ê biçin Minbicê, Kobanê, Qamişlo, Dêrikê, em ê wan deveran ji YPG/YPJ'ê bistînin. Wekî din em ê li Başûrê Kurdistanê biçin Qendîlê, filan cihî bigirin". Ji bo Kurdan qir bikin dibêjin, "li ku derê mafên Kurdan hebin, li ku derê çepereke siyasî û leşkerî ya Kurdan hebe em ê biçin wê derê, biperçiqînin û ji holê rakin". Polîtîkayeke bi vî rengî ya şer a êrîşkariyê dimeşînin. Vê polîtîkaya şer li derve û hundir rê li ber fikaran vekir û gelên Rojhilata Navîn nerazîbûn nîşan dan. Lewma polîtîkayên desthilatdariyê hem li hundir hem jî li derve bûn mijara nîqaş û lêpîrsînê."
Mûstafa Karasû da xuyakirin ku desthilatdariya AKP-MHP'ê bi dagirkirina Efrînê re xwest piştgiriyê ji civakê bigire, bi vî rengî desthilatdariya xwe bidomîne û got, "Lê xuya ye tişta dixwest bi dest nexistine. Dibe ku di wergirtina biryara hilbijartinê de para dagirkirina Efrînê hebe. Lê belê di anketan de ku piştî dagirkirina Efrînê hatin kirin, hate dîtin ku dagirkirina Efrînê têrê nake ku desthilatdariya AKP'ê li ser piyan bimîne."
Endamê Konseya Rêveber a KCK'ê di dewama axaftina xwe de işaret bi girîngî û wateya hilbijartinên 24'ê Hezîranê ji bo gelê Kurd, hêzên demokratîk û çepgir kir û wiha axivî, "Li aliyê Kurdan pêvajoyeke gelekî cidî rû da. Piştî 7'ê Hezîranê êrîşên giran li gelê Kurd hatin kirin. Êrîşên giran li hêzên demokrasiyê hatin kirin. Li Pirsûsê, li Enqereyê komkujî hatin kirin. Piştre bajarên Kurdan hatin xerakirin û şewitandin. Bi sedan mirov şehîd bûn. Efrîn hate dagirkirin. Bûyerên gelekî trajîk û dramatîk anîn serê Kurdan."
Ji bo hêzên çep û demokratîk jî xwedî gelek wateyên cuda ye. Piştî 7'ê Hezîranê li dijî hêzên çep û demokatîk êrîşên giran hatin kirin. Wisa li hêzên demokrasiyê kirin ku nema karibin nefesê bistînin."

### WÊ GUHERTINÊN GIRÎNG BIBIN

Mûstafa Karasû destnîşan kir ku bi hilbijartinên 24'ê Hezîranê re wê guhertinên girîng bibin û wiha dewam kir: "Eger AKP-MHP bi rêya hilbijartinê ji desthilatdariyê bê xistin, wê faşîzma olperest-neteweperest a desthilatdariy AKP'ê biheje. Hemû planên wan ku li burokrasî, edalet, perwerde û gelek qadên din dixwazin Tirkiyê li gorî xwe dîzayn bikin, wê têk biçin. Zext û zordariya li ser Kurdan, hêzên demokrasiyê û civakê heye, wê sist bibe. Bi vê yekê re wê bêhn bê ber hêzên demokrasiyê û azadiyê. Eger gel xwedî li dengê xwe derkeve, dikare vê desthilatdariyê bi hilbijartinê biguherîne. Dikare êrîşkariya faşîst a vê desthilatdariyê qels bike. Bêguman tenê dengdan têrê nake. Lazim e xwedî li deng bê derketin. Wekî din, ji bo HDP ji bendê derbas bibe divê karekî gelekî zêde were kirin. Ne ku bi rêjeya 1 an jî 2'an HDP bi ser bendê bikeve. Divê HDP dengekî welê zêde bigire ku desthilatdariya AKP'ê hîleyan bike jî nikaribe HDP'ê li binê bendê bihêle. Ev yek pêkan e."
Endamê Konseya Rêveber a KCK'ê Mûstafa Karasû di dawiya nirxandina xwe de anî ziman ku hilbijartinên 24'ê Hezîranê yek ji girîngtirîn hilbijartinên dîroka Tirkiyê ji bo têkoşîna demokrasiyê û got, "Dibe ku di dîroka Tirkiyê de ti hilbijartin ewqasî girîng nebû. Ji ber ku hilbijartinên din ên li Tiriyê di nava sîstema heyî de guhertina desthilatdariya partiyan bû. Lê niha ne bi vî rengî ye. Niha hewl tê dayin sîstemeke nû bê avakirin. Erdogan, AKP dixwazin sîstemeke olperest-neteweperest ava bike. Ji ber vê yekê, eger ev sîstem ava bibe wê zext û zordariya li ser hêzên demokrasiyê, li ser hêzên gel, li ser Kurdan, Elewiyan û hemû civatên etnîkî û olî mayinde bibe. Mîna DAÎŞ'ê wê feraseta xwe ya ol ferz bike. Ji bo pêşî li van hemûyan were girtin, hilbijartina dawiyê girîng e. Divê ev weke beşekî girîng ê têkoşîna demokrasiyê bê dîtin. Nêzîkatiya me bi vî rengî ye. Banga me jî bi vî rengî ye."

## YNK'ê dagirkeriya Tirk mehkûm kir



Berdevkê Yekîtiya Niştîmanî ya Kurdistanê YNK'ê Sedî Ehmed Pîre têkildarî dagirkeriya dewleta Tirk û ji aliyê Îranê ve girtina ava Zê yê biçûk got; "Ev binpêkirina serweriyê ne. Weke YNK em dagirkeriyê mehkûm dikin."
Berdevkê Yekîtiya Niştîmanî ya Kurdistanê YNK'ê Sedî Ehmed Pîre piştî civîna Encûmena Rêveberiya YNK'ê li Silêmaniyê civîna çapemeniyê lidar xist.
Pîrê eşkere kir ku di civîna du rojan a Encûmena Rêveberiya YNK'ê de biryar dane ku komîsyonekê ava bikin, ji bo serdana aliyan bike da ku destkeftiyên Kurdan li Bexda bi dest bixin û yên heyîn biparêzin.
Pîrê da zanîn ku di civînê de behsa encamên hilbijartinê jî kirine û diyar kir ku li gorî YNK'ê mafê aliyane rexne bikin û got; "Weke YNK ji bo bi hemû awayî hejmartina dengan bê minetîn û amadene. Me komîsyonek ava kiriye da ku dema kongreya YNK'ê eşkere bike. Wê di nava çend rojên bê de dema kongreyê eşkere bikin."
Berdevkê Yekîtiya Niştîmanî ya Kurdistanê YNK'ê Sedî Ehmed Pîrê têkildarî helwesta YNK'ê ya li dijî dagirkeriya dewleta Tirk wiha axivî; "Ev yek binpêkirina serweriya xaka Iraqê ye. Divê hikûmeta Iraqê li ser mijarê bibe xwedî bersiv. Lê weke YNK em hemû dagirkeriyan mehkûm dikin. Tirkiye çawa ku dixwaze serweriya xaka xwe biparêze, bi vî awayî divê serweriya xaka Iraqê jî bê parastin. "
Pîrê girtina ava Zêyê biçûk ji aliyê Îranê ve jî mehkûm kir û got ku destdirêjiya serweriya xaka Iraqê ye…***ROJNEWS***

## Bila Demîrtaş bê berdan

Raportora Tirkiyê ya Parlamenta Ewropayê Katî Pîrî xwest, namzetê Serokkomariyê yê HDP'ê Selaheddîn Demîrtaş bê berdan.
Katî Pîrî li ser hesabê Twitterê bi etîketa #FreeDemirtaş (Azadî ji Demîrtaş re) peyamek weşand.
Parlamentera Hollandayî Pîrî bi bîr xist ku namzetê HDP'ê Demîrtaş neçar maye ku li girtîgehê kampanya hilbijartinê bimeşîne.
Raportora Parlamenta Ewropayê Pîrî diyar kir ku namzetê CHP'ê yê Serokkomariyê Mûharrem Înce û namzeta Îyî Partî Meral Akşener ji bo berdana Demîrtaş bang kirine û got, "Ancax wê wextê kampanyayeke adîl a hilbijartinê bê meşandin."Pîrî diyar kir, hemû demokrat divê destekê bidin vê daxwazê.

## Ev hilbijartina qederê ye

Hevseroka Giştî ya HDP'ê Pervîn Bûldan li navçeyên bajarê Tirkiyê Stenbolê tevlî vekirina buroyên hilbijartinê bû. Bûldan li vê derê axivî û got ku, "Ev welat bi darê zorê nayê birêvebirin."
Hevseroka Giştî ya HDP'ê Pervîn Bûldan di vekirina buroya hilbijartinê li navçeyên Stenbolê de axivî. Bûldan got, "AKP li Stenbolê têk çûye."

### DEMÎRTAŞ BÛYE KABÛSA ERDOGAN

Erdogan li Amedê qala Demîrtaş dike yê ku li Edîrneyê ye. Bawer im van rojan Demîrtaş dikeve xewna Erdogan û wisa dixuye ku tirsa Erdogan zêdetir bûye. Erdogan qala bûyerên 6-8'ê Cotmehê dike. Me xwest ji bo lêkolîna bûyeran li meclîsê komîsyon were vekirin lê parlementerên AKP'ê vê daxwaza me red kirin. Ji ber ku ew dizanin kesên di bûyerên 6-8'ê Cotmehê de hatine kuştin, bi çekên polîs û leşkeran hatine kuştin."

### DEMÎRTAŞ SERBEST BERDIN

Heke cesareta wan hebe ew ê Demîrtaş serbest berdin. Heke kî sûcdar be, ew ê gel biryara xwe bide. 20 rojên din ew ê ampula AKP'ê biteqe. Bi serokkomariya Demîrtaş û bi temsîliyeta xurt a HDP'ê em mîsogeriya jiyana azad û aştiyane didin. Ev welat bi darê zorê nayê birêvebirin. 24'ê Hezîranê ew ê roja yekîtî û hevgirtina Kurdan be.

### EV WELAT NE MECBURÎ ERDOGAN E

Bi salan xwestin Kurdan parçe bikin. Bi salan mafê siyasetê nedan Kurdan.



10 parlamenterên me girtî ne, qeyûm tayînî şarederiyan kirin, êrîşî hemû nirxên gelê Kurd kirin, goristanên me bombebaran kirin, peykerê Ehmedê Xanê hilweşandin, peykerê Ûgûr Kaymaz hilweşandin, tecrîd anîn girtîgehan, tecrîda li Îmralî hê didome. Tehemula vî welatî ji Erdogan û AKP'ê re nema. Ev welat ne mecbûrî AKP'ê û Erdogan e, HDP heye, Selaheddîn Demîrtaş heye.
AKP ya ku milê xwe dayî MHP'ê, partiya Bahçelî yê ku dema ku Sûr û Cizîr dihate şewitandin, digot kevir li ser kevir, serî li ser laş nehêlin e. AKP partiyeke xwedî vê hişmendiyê dixwaze di nava lîsteyên xwe de derbasî parlamentoyê bike. Bila kesek ji bîr neke, ger HDP derveyî parlamentoyê were hiştin wê desthilatdariya 16 salan zilma kirî înkar bike; wê ev hemû bi zêdeyî bidome.
Parlamenterên me û hevşaredarên me di girtîgehê de ne. Dema ku hûn çûyîn we dengê xwe da destê xwe danin li ser wijdana xwe û bêjin 'Êdî Bes e". Em ê bi hev re ji AKP'ê re bêjin 'Êdî Bes e'. Ev hilbijartineke ya qederê ye. Em dizanin hûn ê dengê xwe yê destpêkê bidin HDP'ê. Kesê ku carekê dengê xwe bide HDP'ê nikare êdî destê xwe ji HDP'ê vekişîne. Dengek ji bo HDP'ê dengek ji bo Demîrtaş."



# AKP frena wê teqiyaye divê em bidin sekinandin

***Hevseroka HDP'ê ya berê Fîgen Yuksekdag ku di girtîgeha Tirkiyê de girtî ye diyar kir ku Frena AKP'ê teqiya ye, nikare bisekine, divê em bidin sekinandin. Jin bi tifaqek xurt dikevin hilbijartinan û wê bi ser bikevin. Yuksekdag got, "Her tişt ji muxalefetê re qedexe ye. AKP bi darbe û çoyê destê xwe kampanyaya hilbijartinê dimeşîne."***

Hevseroka HDP'ê ya berê Fîgen Yuksekdag ku girtî ye, diyar kir ku beriya tifaqa 'Cumhur' û 'Mîllet', tifaqa 'gelan' a HDP'ê ava bûye û wiha got: "Dema rawestandina vê pêşveçûnê hatiye. Frenê AKP'ê teqiya ye, nikare bisekine, divê em bidin sekinandin. Jin bi tifaqek xurt dikevin hilbijartinan wê bi ser bikevin."
Hevseroka Giştî ya berê ya HDP'ê Fîgen Yuksekdag ku ev salek û nîve li Girtîgeha Hejmara 'ê ya Tîpa F ya Kandirayê de girtiye, derbarê hilbijartinên 24'ê Hezîranê de ji JINNEWS'ê re axivî.
Yuksekdag diyar kir ku di bin şertên ne demokratîk de hilbijartin ne rewa ye û wiha got, "Em îro dibînin ku bi mînakên pratîk ev pisgirêk kûrtir bûye. Her tişt ji muxalefetê re qedexe ye. Bi darbe û çoyê destê xwe kampanyaya hilbijartinê dimeşînin. Ji ber van OHAL nehat rakirin.
Desthilatdariyê li ser muxalefetê zextên giran û qeyranek mezin afirandiye. Di alî siyasî de ev demek dirêj e welat ber bi şer, darbe û kaosê ve birin. Her wiha qeyrana aborî jî li vê zêde bû. Tifaqa AKP-MHP'ê wê dîsa fatureya krîza bixwe afirandine li gel bibirin.
Şertên giran ên hilbijartinê yên dijdemokratîk, di alî jinan de du qat zêdetir tê dîtin. Ewlehiya canê jinan tuneye. Ji bo jinan ji mekanîzmayên temsiliyeta siyasî derbixin, di şexsê HDP û DBP'ê de operasyonek berfireh hat kirin. Qeyûm tayînî şaredariyan kirin û saziya hevserokatiyê xespkirin. Di vê pêvajoyê de 43 saziyên jinan ên girêdayî şaredariyan hatin girtin. Ligel vê gelek saziyên din yên jinan hatin girtin. Ji ber vê divê jin bi awayekî çalak tevlî xebatên hilbijartinan bibin û bersiva herî xurt a jinan ya li dijî van êrîşan wê ev be."
Yuksekdag da zanîn ku AKP ti soza ku bide gel nemaye û wiha dewam kir, "Ev 17 sale her cureyê hêz û derfetê bi kar aniye û niha jî xwe dubare dike. Rewşa rihê wê yê westyayî û tengezar bûye, heye. Dema mirov li gotinên Erdogan û yên derdora wî dinêrin mirov dibînin ku ew jî ji axaftinên xwe êdî bêzar bûne. Di hundir de jî di derve jî enerjiyê pêk nayne. Dema mirov li soz û gotinên wan dinêrin, mirov dibînin ku hilberîneriya wan a siyasî têk çûye, desthilatdariyek ku zirarê dide xwe û derdora xwe heye. Dema mirov vê dibînin ne pêkan e ku mirov terza îcraatek bi tendurist bibînin. AKP û Erdogan bi şer, qeyran, OHAL û yek mêrî dertên pêşberî hilbijêran.




## Erdogan li têkçûna xwe mikur hat




Berdevkê HDP'ê Ayhan Bîlgen li navenda giştî ya partiya xwe civîneke çapemeniyê li dar xist û mijarên di rojevê de nirxand.
Berdevkê Partiya Demokratîk a Gelan (HDP) Ayhan Bîlgen diyar kir ku ji 28'ê Nîsanê û vir ve di operasyonên dijî HDP'ê de 136 kes hatine destgîrkirin û 14 jê hatine girtin.
Bîlgen işaret bi serdana Erdogan a ku 3'yê Hezîranê li Amedê kir û got, "Rastî berevajî kir û bi vî rengî axivî. Hilbijartin sala 2015'an hate kirin, lê Serokkomar got, 'Dengên ji HDP'ê re hatin dayin kir ku gewî bibin û HDP'ê gel daxist kolanan'. Nepêkane ku yek bi dengê sala 2015'an rabe mirovan sala 2014'an daxîne kolanan. Teknolojiyeke bi vî rengî hê neafiriye. Dibêje ku me li Amedê 'kûleya saetê' xera kirine. Halbûkî li Amedê kûleya saetê nîne. Amedî hemû bi vê rastiyê zanin, lê xuya ye yên ku li wê qadê ew pêşwazî kirin ti ji wan ji Amedê ye, lewma her kesî li ber van gotinên wî jê re li çepikan xist."
Bîlgen diyar kir ku rojeva bingehîn a vê hilbijartinê, hiştina HDP'ê li binê bendê ye û wiha dewam kir: "Hem benda ji sedî 10'an ranake, hem jî hewl dide HDP'ê di binê bendê de bihêle û bi vî rengî serketina xwe ragihîne. Bêguman ev yek pirsgirêkeke exlaqa siyasî ye. Dengdêr kê biecibîne wê dengê xwe bide wê partiyê. Eger bend tenê li dijî HDP'ê nayê rakirin û tevî vê yekê bi her awayî zext û zordarî li HDP'ê tê kirin, hingî dengdêrên deng didin AKP'ê jî dikarin vê rewşê binirxînin.
Serokkomar îdîa kir ku pirsgirêka Kurd qediya ye. Bi îdîa û soza çareserkirina pirsgirêka Kurd bi rê ket, lê bêyî ku tiştekî bike niha radibe dibêje 'pirsgirêka Kurd qediya ye'. Ev yek mikurhatina li têkçûna desthilatdariyê ye. Di ser çalakiyên Kobanê re gefê li partiya me û namzetê me Demîrtaş dixwe... Me 11 caran pêşniyar kir ku ji bo lêkolînkirina bûyerên Kobanê li Meclîsê komîsyon were avakirin. Lê pêşniyara me her carê bi dengên AKP'ê hate redkirin. Hûn naxwazin bê lêkolînkiri, naxwazin rastî eşkere bibin û radibin partiya me dikin hedef.
Em mirina kesî qebûl nakin. Em dixwazin hemû kiryar bên dîtin. Lê belê hinek radibin cihêkariyê dixin navbera mirina mirovan. Di gilînameya me hemûyan de tespîteke zelal heye. Derbarê mirina 5-6 kesî de dadgerî li ser kar e. Lê belê ne li ser wezîfedarên emniyetê yên li Çewligê mirin, ne jî li ser endamên partiya me yên mirin, dadgerî tiştekî nake. Ev yek bi xwe jî nîşan dide bê di kîjan astê de operasyoneke xapandinê heye."

## AKP'ê li cihê peykerê Ehmedê Xanê restorant çêkir

Li Bazîdê li cihê peykerê Ehmedê Xanê ku ji aliyê AKP'ê ve hatibû hilweşandin, restorant hate çêkirin!.
Li navçeya Bazîdê ya Agiriyê peykerê Ehmedê Xanê yê li nava Parka Ehmedê Xanê yê li Caddeya Agiriya Mezin di 22'ê Hezîrana 2017'an de ji aliyê qeymeqam û qeyûmê Bazîdê Ûlaş Akhan ve hatibû hilweşandin.

### QEYÛM GOTIBÛ 'BI ŞAŞITÎ ÇÊBÛ'


Peykerê Fîlozofê Kurd Ehmedê Xanê yê di nava Parka Ehmedê Xanî ya li ser Caddeya Agiriya Mezin a navçeya Bazîda Agiriyê di 22'ê Hezîrana 2017'an de ji aliyê qeymeqam û qeyûmê Bazîdê Ulaş Akhan ve hatibû rûxandin. Qeyûm Akhan piştî peyker rûxand daxuyanî dabû û gotibû: "Ji ber xebatên çêkirina rê û peyarêyê peykerê Ehmedê Xanê ji ber qezayê zirar dît. Ji ber vê yekê xebatkarên me yên şaredariyê peyker ji cihê wê rakirin. Şaredariya me bi heman awayî ji bo peyker li şûna wê danîn siparîş dane û wê di demeke nêz de dîsa deynin cihê wê."




### RESTORANTA QESRÊ

Lê ligel ku salek di ser rakirina peyker re derbas bû jî, peyker dîsa nedanîn cihê wê û li şûna peykerê Ehmedê Xanê "Sara Harman Cafe, Restaurant, Çayxaneya Malbatê" hat avakirin. Înşaata kafeyê ber bi dawî ve diçe û beşek mezin a parkê hate girtin.

## Leşkerên Tirk ji başûrê Kurdistanê derxînin



'Eniya têkoşîna li dijî dagirkeriya Tirk' xwest, biryar bê dayin ku leşkerên Tirk ji herêma Kurdistanê werin derxistin.
'Eniya têkoşîna li dijî dagirkeriya Tirk' ku ji nûnerên rêxistinên civakî yên sivîl, parlamenter, rûspî û aktîvîstan pêk tê, li Silêmanî daxuyaniyek da çapemeniyê. Daxuyanî li pêşiya nûnertiya Parlamenta Kurdistanê hate dayin. Eniyê li ser mijarê daxwaznameyek pêşkêşî Parlamenta Herêma Kurdistanê kir.

### EM LEŞKERÊN TIRK DERXÎNIN


Endama eniyê Avan Cemal daxuyanî xwend û got, "Em ji parlamenta Herêma Kurdistanê daxwaz dikin li ser dagirkeriya Tirk a li ser xaka Herêma Kurdistanê rûniştineke taybet li dar bixe. Her wiha helwest xwe û nerazîbûna xelkê Herêma Kurdistanê ji raya giştî re ragihîne. Ji bo derxistina leşkerên Tirk ji herêma Kurdistanê biryarê bide."
Di daxuyaniyê de işaret bi biryara hejmara 37'an a parlamentê hate kirin ku sala 2003'an li ser derxistina leşkerên Tirk ji herêma Kurdistanê hate dayin û ji parlamentê hate xwestin ku vê biryarê bi cih bîne.

### HEBÛNA LEŞKERÊN TIRK NE QANÛNÎ YE

Piştre parlamenterê Tevgera Goran li Parlamenta Herêma Kurdistanê Şêrko Heme Emîn axivî û got; "Em vê daxwaza hatiye kirin gelekî girîng dibînin em ê kar li ser bikin. Em ê hewl bidin parlamenta Herêma Kurdistanê di demek herî zû de rûniştinek taybet li ser vê mijarê lidar bixe û biryara pêwîst li ser bide. Ji ber em jî ji dagirkirina axa Herêma Kurdistanê nerazîne. Hebûna hemû leşkerên Tirk û Îranê li ser xaka Herêma Kurdistanê ne qanûnî ye."
Parlamenta Herêma Kurdistanê sala 2003'an ji bo derxistina hêzên biyanî (artêşa Tirk) li nava herêma Kurdistanê biryara hejmara 37'an derxistibû.

## Êzidî dagirkeriyê qebûl nakin





Êzidiyên Efrînê yên li kampa Serdemê gotin, "Em dagirkeriya Tirkiyê qebûl nakin. Ji ber ku diz in, mal û milkên me talan dikin, jin û zilamên me direvînin, gorên me yên pîroz dirûxînin."
Hejmarek Êzidiyên Efrînê yên li kampa Serdemê nerazîbûnên xwe nîşanî kirinên ku li Efrînê ji aliyê leşkerên artêşa Tirk a dagirker û çeteyên girêdayî wê ve têne kirin, dan.
Ebdo Xalo ji gundê Kefer Zeyt derbarê mijarê de got, "Em ji Efrîn derketin da ku ol û rûmeta xwe ji hovîtiya dagirkeriya Tirkiyê û çeteyên girêdayî wê biparêzin. Ji ber tirbên me yên pîroz xirab dikin, bi navê Islamê milkên me talan dikin, kirinên wan di tu baweriyan de nayê qebûlkirin."
Ebdo, anî ziman ku çeteyên dewleta Tirk welatiyên li Efrînê yên nedikarîn ji Efrînê derkevin neçar dikin ku dev ji baweriya xwe berdin û bibin misilman, destmalan li ser jinan feriz dikin û her kesî neçar dikin ku rojî bigirin û nimêjê bikin. Ebdo Xalo got, "kes van qanûnan pêk neyne pereyan ji wan dixwaze, armanca wan qirkirina baweriyan e."
Welatiya bi navê Qudret Betal êrîşên dewleta Tirk a dagirker li ser Efrînê bi bîr xist û wiha got, "Li Efrînê tiştek ji hovîtiya çeteyan xilas nebû, em neçar man ji Efrînê derkevin ji bo çeteyên Tirkiyê mîna kiryarên li Şengalê li dijî me dûbare nekin, pîrozgehên me xirab dikin û me weke kafîr nîşan didin."
Kamîran Xalo jî destnîşan kir ku ew dagirkeriya Tirkiyê qebûl nakin û wiha domand, "Dagirkeriya Tirkiyê û çeteyên wê, li pêşberî civaka navdewletî bi çekên qedexekirî em bomebebaran kirin. Di rojên munasebet û şahiyan de em diçûn goran li gundê Feqîra yê navçeya Cindirêsê û yên li gundê Qestel Cindo yê navçeya Şera. Lê çeteyên dagirkeriya Tirkiyê ew dever xirab kirin."
Kamîran Xalo, bang li civaka navdewletî û rêxistinên hiqûqî kir ku girantiya vegera welatiyên Efrînê bide…***ANHA***